
# Xeyalên xwe xêz dike



Roşan Sîno ya bi temenê 13 Salî ku ji gundê Mîrkan yê navçeya Mabeta ya Efrînê ye ku bi wêneyên xêz dike xeyalên xwe pêk tîne. Dewleta tirk û çeteyan gund û axa wê dagir kirin lê wê dev ji xeyalên xwe berneda.

Sîno got ku li Şehbayê xêzkariyê didomîne û wiha got: "Ez ê heta dawiyê li pey xeyalên xwe bim û rê nedim ku dagirker bi siyasetên xwe yên qirêj xeyalên min talan bikin, ez ê xêzkirina wêneyan berdewam bikim."... RÛPEL-2

# Dengbêjî hezkirin e

Dengbêjî jî rêbazeke ragihandinê ya herî kevn e û devkî ye. Heta nivîs hatiye kifşkirin û pê berhem hatine afirandin jî girîngiya xwe ya di nav civakan de domandiye lê di salên dawîn de eleqeya ji bo dengbêjiyê kêm dibe.



Lêkolîner Mahmûd Begîk têkildarî dengbêj Reso pirtûkek amade kir û bi awayekî berfireh naverok û mijara kilamên ku Reso vegotiye. Her wiha Begîk got ku dengbêj berê di civakê de gelek bi qîmet bûne û dengbejî hezkirin û qabileyet e nikare bê hînkirin... R 6


e-rojname

17 Kanûn - Duşem 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 207


## Heqê dewlete û heqê merdiman



Heq, edalet û hiqûq… Her wext nê hîrê çiyê muhîmî bîyê babetê munaqaşeyan û her kes goreyê xo nê her hîrê çiyanê muhîman şuxulnayo. Heq her çiyî ra ver seba heme merdimayîye esto û çiyo ke bêro dayene ney çiyo ke xura eîdê merdimî yo. Labelê tarîxê merdimayîye naye bi tewrêko bîn ma rê nîşan dano. Heq û hiqûq na çarçewe de vejîyenî ma ver... *Nûşteyê U. Serhildan Andan* / *R.5*

# Bêdem û bêdorveger

**Çalakiyên greva birçîbûnê li girtîgeh û Ewropayê vediguherin grevên birçîbûnê yên bêdem û bêdorveger. Li girtîgehan 30 û li Ewropayê 18 kesan dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger kir**




### KET ROJA 40'EMÎN

Hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakinin 40 roj in di girtîgeha Tîpa E ya Amedê de ketiye greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger. Hat ragihandin ku rewşa Leyla Guven roj bi roj giran dibe.

### BERXWEDANA GIRTÎGEHAN

Ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan grevên birçîbûnê berbelav dibin û grev vediguherin çalakiyên greva birçîbûnê yên bêdem û bêdorveger. Li girtîgehên Tîpa E û D yên Amedê, Wan, Gebze, Patnos, Kandirayê 30 girtî 2 roj in di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ne. Li hinek girtîgehan jî komên nû grev dewr girtin.

### LI STRASBOÛRGÊ 18 KES

Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên Ewropayê (KCDK-E) aşkera kir ku, dê li dijî tecrîdê îro li Strasboûrgê 18 kes dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger bikin. Li Hewlêrê ji çalakgeran endamê HDP'ê Nasir Yagiz çalakiya xwe wergerandiye greva bêdem û bêdorveger û 27 roj in di grevê de ye... *R- 3*




## Li Efrînê 25 çete hatin kuştin

Artêşa tirk û çete li Efrînê derbên giran dixwin. Li Efrînê erebeyeke bombebarkirî teqiya. Di encama teqîna mezin de, 25 çeteyên Cebhet El Şamiyê hatin kuştin, 10 jî birîndar bûn... *RÛPEL - 3*



## 2 febrîqe û 2 kargeh hatin şewitandin

Koordînasyona Tevgera Ciwanên Şoreşger (DGH) diyar kir ku ji bo şikandina tecrîdê û azadiya Abdullah Ocalan li Stenbol, Antalya û İzmîrê çalakî li darxistine û 2 kargeh û 2 febrîqe hatine şewitandin.




## Vê carê jî di zinaran de ketin!

Leşkerên tirk nikarin xwe li Kurdistanê bigirin. Artêşa tirk ragihand ku li navçeya Şirwanê ya Sêrtê operasyon pêk anîne û di vê operasyonê de 10 leşkerên wê di zinaran de ketine û birîndar bûne. ... *RÛPEL - 3*



## Meseleyê tecrîdî de Tirkîye krîtîk kerdêne

Dîrektora HRWyî ya Tirkîye Emma Sinclaire daye zanayene ke standardê bewlîkerde yê CPTyî estê û va: "Ma sey Human Rights Watchî hemverê her tewirê tecrîdî de yê. Xusûsen CPTyî xeylî reyan meseleyê tecrîdî de Tirkîye krîtîk kerdêne. 2 serrî ra vêşêr yewna kesî dir pênêdîyayîşê Ocalanî nêno qebûlkerdene. Ewropa rind zana ke Tirkîye de se bena. Naye ra binpaykerdişê heqanê merdiman ê Tirkîye yenê peygoşkerdene."... *RÛPEL - 5*

## Sedema krîzê polîtîkayên şer in

Pêkhateyên Platforma Şaxan a KESK'ê ya Amedê li qada İstasyonê bi dirûşma "Ne kedkar, bila yên krîz ava kirine fatûreya krîzê bidin" bi tevlêbûna hezaran kesî mîting li dar xistin. Li qada mîtîngê pankartên "Zimanê zikmakî azadiya me ye", "Bijî têkoşîna ked û demokrasiyê", "Li dijî xizanî, betalî û nelirêtiyê em bi hev re têbikoşin", "Jin, jiyan, azadî" û "KHK dê biçin em ê vegerin" hatin vekirin. Hevserokê Giştî yê KESK'ê Mehmet Bozgeyîk di mîtîngê de axivî û diyar kir ku krîza heyî ya li Tirkiyeyê ji ber polîtîkayên şer ên desthilata AKP'ê ye... *R.3*



## YE'yê ji bo bakurê Sûriyeyê hişyar kir

Nûnera Bilind a Têkiliyên Derve û Siyaseta Ewlekariyê ya Yekitiya Ewropayê (YE) Federica Mehoherini li ser gefên Tirkiyeyê yên li dijî Minbic û bakurê Sûriyeyê axivî. Mogherini diyar kir ku operasyoneke ji aliyê Tirkiyeyê ve li dijî bakurê Sûriyeyê pêk were cihê metirsiyê ye û hişyarî da Tirkiyeyê ku xesarê nede têkoşîna koalîsyona Navneteweyî ya li dijî DAIŞ'ê... *RÛPEL - 4*

JIN
17 Kanûn 2018 Duşem




## 'Divê hesab ji qatilên jinan were pirsîn'

**HESEKÊ -** Li gundê Şemsane yê girêdayî bajarokê Mergeda yê navçeya Şedadê, cenazeyê dayika bi navê Hemda Hawas ku dayika 3 zarokan e, hate dîtin û heta niha nehatiye zanîn bê ka ji aliyê kê ve hatiye qetilkirin. Di vê çarçoveyê de Kongreya Star a navçeya Şedadê bi daxuyaniyekê qetilkirina jinan şermezar kir û bang li aliyên pêwendîdar kir ku hesab ji qatilên jinan were xwestin. Jinan di daxuyaniya xwe de got ew tu carî der barê qetilkirina jinan de bêdeng namînin û bang li aliyên pêwendîdar kir ku lêkolînê der barê qetilkirina jinan de bidin destpêbikirin û hesab ji qatilên jinan û kesên ku dixwazin ewlehiya herêmê tevlihev bikin, bixwazin.

# Em ê gelê xwe li hemberî êrîşan biparêzin

Tevgera Azadiya Jinên ÊzidxanêT(TAJÊ) bi daxuyaniyeke nivîskî êrîşên dewleta tirk ên li ser Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) û Şengalê şermezar kirin. TAJÊ'yê aşkera kir ku divê gel bi tifaqê êrîşan pûç bike. Em ê weke parastina jinan li hemberî hemû êrîşan gelê xwe biparêzin


Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) têkildarî êrîşên dewleta tirk ên li ser Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) û Şengalê daxuyaniyeke nivîskî weşand. TAJÊ'yê di daxuyaniya xwe de êrîşan bi tundî şermezar kir.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Êrîşên hewayî ku di 13 'ê kanûnê de ji aliyê dewleta tirk ve li ser Mexmûr û Şengalê pêk hatiye, êrîşeke dij mirovî ye. Di encama van êrîşan de, 4 jinên sivîl li Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî jiyana xwe ji dest dan. Glê wargehê ji ber zilm û zordariya dewleta tirk neçar mabû cih û warên xwe li bakurê Kurdistanê berdin û jiyanek penaberî di bin sîwana Neteweyên Yekbuyî de bidomînin. Lê mixabin dewleta tirk a faşîst ku tu maf û zagonan nas nake heya roja me ya îro jî zexta li ser gelê me yê Mexmûrê her ku diçe zêdetir dike. Wek Tevgera Azadiya Jinên Êzidxanê em van erîşan şermezar dikin. Hedef û armanca van erîşan ji bo berjewendiyen xwe çavtirsandina gel û parçekirin e. Gelê me yê Mexmûrê gelekî ku bi berxwedan û têkoşîna xwe ya li hemberî bêdaletî û nehaqiyê tê naskirin. Tu carî serî li hemberî zaliman netewandiye. Ji ber vê rastiyê, siyaseta qirkirinê ku dewleta tirk li ser civakê disepîne, bi ser nakeve. "

**' Li nirxên xwe xwedî derkevin'**

Di berdewama daxuyaniyê de wiha tê gotin; "Dîsan li Şengalê di rojên Cejna Êzî de êrîşek wiha qirêj ku di encamê de 3 sivîlan jiyana xwe ji dest dane, bê rûmetî û binpêkirina nirxên civakê ye. Gelê me yê êzidî ku bi dehan caran rû bi rûyî fermanan maye û piştî fermana dawî ya çeteyên DAIŞ'ê berxwedaniyek û yekitiyek dîrokî pêk aniye, pewîst e ev ruhê berxwedanê bilindtir bike. Ew ê tifaq û yekitiya xwe xurttir bikin. Pêwîst e ku li hemberî ev êrîşên hovane civaka me ya êzidî, xwe bi rêxistin bike, di xweseriya demokratîk û birdoziya neteweya demokratîk de bi israr be û xwedî li ol, vîn û nirxên gelê xwe derbikeve. Bi vî awayî gelê me yê êzidî dikare van êrîşan vale derbixîne. Civaka me ya Êzidxanê civakeke ku bi zanebûn û hişyarî tevdigere ye. Her çiqas dewleta tirk ser gelê me yê Şengalê êrîşên xwe bidomîne û bixwaze bi teknolojiya xwe civakê belav bike, ew ê bersiva van êrîşan jî xweseriya demokratîk, birdoziya neteweya demokratîk û bihêzkirina tifaqa gelê êzidî be. *ŞENGAL*



## 'Di demên herî xerab de têkoşiyam'

Gulcan Bîter a di 13 saliya xwe de ji ber ku gundê wan hat valakirin koçberî nas kir û li metropolan tevî temenê biçûk di tekstîlan de xebitî û ji aliyê mêrê pê re zewicî ve rastî tundiyê hat. Bîter diyar kir ku tevî hemû zor û zehmetiyan wê dest ji berxwedanê bernedaye.

Bîter ku li gundê girêdayî Pilûr a Dêrsîmê dijiya di 1994'an de bi darê zorê ji gund hatin derxistin û wek jinekê barê koçberiyê ji biçûkatiyê de hildigire. Niha 37 salî ye her tim li dijî pêkanînên dijmirovî û tundiyê li ber xwe daye.

Bîter diyar kir ku dema koç kirine 13 salî bûye û wiha pê de çû: "Dayika min ji me re axurekî nû ji bo sewalan çêkiribû. Lê rojekê fermandarê qerekolê hat û got van deran terk bikin. Piştre xaniyê me hat şewitandin û me koç kir. Em neçar man dibistanê terk bikin. Em li dibistana razayî man. Tundî li me hat kirin. Me li Stenbolê dev ji dibistanê berda. Em li tekstîlê xebitîn. Em bi salan di karên giran de xebitîn. Ez di 23 saliya xwe de zewicîm. Heta zarokên min çêbûn ez xebitîm."

**'Min serî netewand'**

Di dawiya axaftina xwe de Bîter bi lêv kir ku di zewaca xwe de tiştên herî giran jiyaye û wiha pê de çû: "Ez rastî tundiya hevjînê xwe hatim. Min hem tundiya fizîkî hem jî ya psîkolojîk dît. Min tu car serî netewand. Tevî her tiştî min ji bo zarokên xwe li ber xwe da."

Bîter ku salek berê vegeriya warê kal û pîrên xwe Pilûrê û li vê derê di kooperatîfê de dixebite. Di heman demê de zarokên xwe jî dişîne dibistanê. Bîter herî dawî ev tişt got: "Min li ber xwe da. Ez xurt im û niha gelek kêfxweş û aram im." *DÊRSÎM*

## Em hînî penaberiyê nebûn em ê hînî tecîrîdê jî nabin

Jinên Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî diyar kir ku heya ew agahiyekê ji Rêberê xwe negirin wê çalakiyên xwe berdewam bikin. Jinan da zanîn ku ew fêrî penaberiyê nebûn wê fêrî tecrîdê jî nebin û wê ji bo şikandina tecrîdê bi her awayî çalakiyên xwe berdewam bikin.

Yek ji van jinên ku tev li çalakiyê bûye Cemîle Korkmas wiha got: "Em jî weke jinên wargehê li hemberî tecrîdê tev li çalakiya greva birçîbûnê bûne. Heya ku em agahiyekê ji Rêberê xwe negirin em ê çalakiya xwe berdewam bikin. Weke jinên wargehê em li pey Rêberê û şehîdên xwe ne, em ê tu carî serî li hemberî dijminan netewînin."

Jina çalakvan a bi navê Mriyem Kara jî ev tişt got: "Ev 20 sal in Rêberê me girtî ye û di bin tecrîdê de ye. Ger ku em îro ranebin ser pêyan em ê kengî rabin. Tecrîda li ser rêberê me li ser me hemûyan e. Em piştevaniya Leyla Guven dikin. Dilşîn Kara jî hestên xwe wiha anîn ziman: "Em jinên ciwan em ê xeta Şehîd Bêrîtan û Şehîd Zîlan bişopînin. Heta dawiyê em ê li Rêberê xwe xwedî derkevin. Heta ku agahiyek ji Rêberê me neyê weke ciwan wê çalakiyên me berdewam bikin."

Sozdar Tallî jî wiha got: "Ez jî weke jinek ciwan tev li çalakiya greva birçîbûnê dibim. Heta dengek ji Rêber APO neyê ciwan dê di nav çalakiyan de bin. Ji bo berdewamkirina giyanê Kemal Pîr û Mazlum Dogan em ê çalakiyên xwe yên ji bo rakirina tecrîdê berdewam bikin. Jina ciwan Buhar Kara jî ev tişt got: "Ev tecrîda giran a ku li ser Rêberê me berdewam dike em weke ciwanên Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî napejirînin. *MEXMÛR*



## Roşan rê neda xeyalên wê têk biçin

Tevî ku dewleta tirk û çeteyên wê Efrîn dagir kirin jî zarokên Efrînê xeyalên xwe pêk tînin. Yek ji van zarokan jî Roşan Sîno ya bi temenê 13 salî ya ji gundê Mîrkan ê navçeya Mabeta ye ku bi xeyalên xwe bi wêneyan xêz dike.

Roşan di temenê 8 salî de li Herêma Efrînê fêrî wênexêziyê bûye û bi tiliyên xwe yên biçûk hestên di dilê xwe de li ser kaxizan dinexşîne.

Piştî ku deweleta tirk û komên girêdayî wê herêma Efrînê dagir kirin Roşan bi malbeta xwe re ji Efrînê derdikeve û li gundê Tel Qirah yê girêdayî kantona Şehbayê bi cih dibe. Tevî hemû şert û mercên zehmet Roşan xêzkirina xeyalên xwe beredewam dike û êşa ku li Efrînê kişandiye bi destên xwe yên biçûk li ser kaxizên spî xêz dike û hezkirina xwe ya Efrînê nîşan dide.

Roşan Sîno ji ajansa me re axivî wiha got: "Ez 8 salî bûm min dest bi xêzkirina wêneyan kir. Li Efrînê min gelek wêne xêz dikirin û ez tev li gelek pêşangehan bûm, bi êrîşên Erdoxan ên li ser Efrînê re ez û bi hezaran zarokan re ji Efrînê derketim. Lê min dev ji xeyalên xwe berneda."

**'Pênûsên rengîn tune ne'**

Roşan di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Li Efrînê min hezkirina xwe ya ji Rêber Apo bi wêneyan nîşan dida. Dema ku bi darê zorê em ji Efrînê derketin min hemû wêneyên xwe bi xwe re derxistin. Em niha li gundê Tel Qirah bi cih bûne, rast e rengên pênûsên ku min berê pê wêne xêz dikirin li Şehbayê tune ne lê dîsa min dev ji xêzkirina wêneyan berneda. Bi pênûsên bê reng ez wêneyên xwe xêz dikim."

Roşan wêneyê zaroka yek mehî ya ku di êrîşên li dijî Efrînê de jiyana xwe ji dest da jî xêz kiriye. *ŞEHAB*



## Ji bo azadiya Ocalan îmze hatin komkirin

Pêngava Komkirina Îmzeyan ku ev demek berê hatibû destpêkirin ji aliyê rêxstina Kongereya Starê ve li kantona Girê Spî û navçeyên wê ji bo azadiya Rêberê Gelê kurd Abdullah Ocelan, îro bi daxuyaniyekê hat bidawîkirin. Di daxuyaniyê de rêvberiya Kongra Star a Girê Spî û navçeya Eyn Îsa û meclisa kantonê û navçeyê jî amede bûn. Daxuyanî li pêşiya navenda Kongreya Starê ji aliyê endama Kongreya Starê Losiyan Matosiyan ve hat xwendin.

Daxuyanî wiha ye: "Di pêşengiya Kongreya Star a Girê Sipî de pêngava komkirina îmezeyan ku ji bo azadiya Rêber Gelê kurd Abdullah Ocelan hatibû destpêkirin îro bi dawî bû û di vê pêngavê de 23 hezar û 389 îmze ji bo azadiya Ocalan hatin komkirin. Ev pêngav ji bo ku dengê gelê azadîxwaz bigihînin tevahî cîhanê û bibêjin em azadiya rêberê xwe dixwazin e. Bangawaziya me ji saziyên mafên mirovan ew e ku tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo werê rakirin."*GIRÊ SIPÎ*




## Li Kobanê dewreya perwerdeya tendirustiyê pêk hat

Dewreya perwerdeyê ya 28 jinên hemşîre ku beriya çend rojan ji perwerdeya Şehîd Lêgerîn ya Akademiya Şehîd Şîlan ya Kongreya Star mezûn bûn, îro li Akademiya Tenduristiyê ya Kantona Kobanê, tev li Perwerdeya bi navê Şehîd Lêgerîn bûn. Waneyên ku di perwerdeyê de bên dayîn wê ji aliyê bijîşkan ve der barê nexweşiyan de bên dayîn. Bi vî rengî wê 6 mehan perwerde dewam bike.

Perwerde di roja yekê de bi beşdarbûna mêvanan dest pê kir. Paşê li ser navê akademiya tendurstiyê bijîşk Talîn Teyar, li ser navê Meclisa Perwerdeyê Felek Yûsif, Endama Têkiliyên Diplomasî ya Akadmiyê Sozan Hesen û hemşîre Fatma Ehmed axavtin kirin. Di axaftinan de wiha hat gotin: "Em bi hêvî ne ku ev perwerde serkeftî derbas bibe. Ji ber ku di rewşa heyî de pêwîstî bi hemşîreyên jin pir heye. Tenduristiya nexweşan berpisiyariya me ye û ev erka bijîşkên jin e jî." *KOBANÊ*

www.arsivakurdi.org



## Pirsgirêkên Iraqê tên çareser kirin!

**BEXDA -** Parlamentarê Hevpeymaniya Mîhwerê Niştimanî Miqdam Cûmeylî di daxuyaniyekê de ragehand ku di demeke nêzîk de pirsgirêka namzetê wezareta navxweyî Falih Feyaz tê çareserkirin û dê li şûna wî yekî din were peywirdarkirin. Parlamentarê Hevpeymaniya Mîhwerê Niştimanî da zanîn ku li gorî danûstandinên di navbera aliyên siyasî de biryar e di rûniştina roja sêşemê ya vê hefteyê deng li zêdekirina kabîneya hikûmetê bi serokatiya Adil Ebdulmehdî were kirin. 26'ê cotmeha 2018'an kabîneya hikûmeta nû bi serokatiya Adil Ebdulmehdî bi 14 wezîran hatibû pesendkirin.

# YE'yê ji bo gefên dagirkirinê Tirkiye hişyar kir

Yekitiya Ewropayê li ser gefên Tirkiyeyê yên li dijî bakurê Sûriyeyê bi daxuyaniyekê hişyarî da Tirkiyeyê ku xwe ji operasyoneke yek alî a li dijî bakurê Sûriyeyê dûr bigire û xesarê nede têkoşîna li dijî DAIŞ'ê. DYA'yê jî bi zimanekî tund heman hişyarî da û nûnerên DYA'yê dibêjin: "Dema fîl şer dikin divê tu ji wê derê dûr bikevî!"

NAVENDA NÛÇEYAN

Nûnera Bilind a Têkiliyên Derve û Siyaseta Ewlekariyê ya Yekitiya Ewropayê (YE) Federica Mehoherini li ser gefên Tirkiyeyê yên li dijî Minbic û bakurê Sûriyeyê axivî. Mogherini diyar kir ku operasyoneke ji aliyê Tirkiyeyê ve li dijî bakurê Sûriyeyê pêk were cihê metirsiyê ye û hişyarî da Tirkiyeyê ku xesarê nede têkoşîna Kalîsyona Navneteweyî ya li dijî DAIŞ'ê û xwe ji hewldanên yek alî dûr bigire.

Mogherini di daxuyaniya xwede aşkera kir ku di şerê li dijî DAIŞ'ê de ber bi dawiyê ve hatiye û niha li Sûriyeyê nêzî çareseriya daîmî bûne. Mogherini rewşa Minbicê jî bibîrxist û ev tişt anî ziman: "Girîng e ku nexşerêya di navbera Minbic û Tirkiyeyê de baş were pêkanîn." Federica Mogherini di dawiya daxuyaniya xwe de jî careke din hişyarî da Tirkiyeyê ku ji operasyonên li dijî DAIŞ'ê tê meşandin re çêneke.

Herçend daxuyaniya YE'ê piştî êrîşên Tirkiye yên li dijî Mexmûr û Şengalê hatibe dayîn jî Federica Mogherini di daxuyaniyê de qet îşaret bi ev êrîş û hovîtiya Tirkiyeyê ya li dijî gelê sivîl nekir.

**'Divê tu ji wê derê dûr bikevî'**

Li aliyê din li gorî raporta rojnameya Şerqulewsetê, berpirsên siyasî û leşkerî yên Amerîkayê ji komên çeteyên girêdayî Tirkiyeyê yên bi navê Artêşa azad û Îtîlafa Niştimanî ya opozisyona Sûriyeyê re ragihandiye ku ji bo artêşa Amerîkayê nêzîkbûna li hemberî Minbicê û rojhilatê çemê Firatê li Sûriyeyê xeta sor e.

Hişyariya berpirsên Amerîkayê piştî gefên Tirkiyeyê yên dagirkirina Minbic û rojhilatê çemê Firatê ya bi 'Artêşa Azad a Sûriyeyê' pêk hatin. Di raportê de amaje bi wê yekê jî hatiye kirin ku hêzên Amerîkayê û Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) li gel hev yek karî dikin û her êrîşeke li dijî HSD'ê 'Rasterast êrîşa li dijî Amerîkayê ye'.

Her wiha nûnerên amerîkî di peyamên xwe de dibêjin, kesên tev li operasyonê bibin tê wê wateyê ku ew rasterast êrîşî Amerîkayê dikin ji ber wê jî dê rastî bersivek tund bên. Rayedarên amerîkî bi kurtî peyayên Tirkiyeyê wiha hişyar dikin: "Dema fîl şer dikin divê tu ji wê derê dûr bikevî!"



# Amerîka: DAIŞ di rojên xwe yên dawiyê de ye

Berdevkê Hevpeymaniya Navneteweyî ya li dijî DAIŞ'ê ragihand ku rêxistina DAIŞ'ê di rojên xwe yên dawiyê de ye.

Berdevkê Hevpeymaniya Navneteweyî ya li dijî DAIŞ'ê Colonel Sean Ryan ragehand ku şerê li dijî DAIŞ'ê li navçeya dawî ya Sûriyeyê berdewam e û di rojên xwe yên dawiyê de ye.

Her wiha Sean Ryan da zanîn ku metirsiya DAIŞ'ê berdewam e û çekdarên xwe kom dike û dikare bombeyan biçîne da ku pêşveçûna HSD'ê steng bike. Berdevkê Hevpeymaniya Navneteweyî tekez kir ku rêxistina DAIŞ'ê rojên xwe yên dawiyê dijî û dê bi dawî bibe.

Li aliyê din Berdevkê Wezareta Navxweyî ya Iraqê Seîd Meîn bi daxuyaniyekê ragihand ku hêzên wan ên ewlehiyê 'alîkarê dadgerê leşkerî' yê çeteyên DAIŞ'ê li navçeya Qadisye ya Kerkûkê girtine. *AMED*





## Çalakiyên Êlekzeran berdewam dikin

Li Fransayê li gel hewaya sar jî çalakiyên Êlekzeran berdewam dikin û duh jî gelek çalakvan li qada Şanzelîze ya Parîsê kom bûn û çalakiyên xwe domandin.

D hefteya 5'emîn de çalakiyên Êlekzeran li Fransayê didomin û herî dawî çalakvan ber bi qada Şanzelize ya paytext Parîsê ve herikîn. Ajansa Fransayê AFP'ê di nûçeya xwe de diyar kir ku saet di 11.00'an de nêzî hezar çalakvanan dîsa dest bi çalakiyan kirin û polîsan 60 çalakvan binçav kirin. Di hefteya derbasbûyî de jî polîsan 500 kes binçav kiribûn. Her wiha gelek polîs û panzêr li nav kolanên Parîsê belav bûne.

Êlekzeran di 17'yê mijdarê de ji ber zêdebûna baca sotemeniyê dest bi çalakiyan kir û çalakî li tevahiya Fransayê belav bûn. *PARÎS*

# Di konferansa COP24'an de li hev kirin

Di konferansa COP24'an de, ku ji aliyê NY'ê ve li Polonyayê hate lidarxistin, li ser tedbîrên di mijara têkoşîna li dijî germahiya global de li hev hate kirin.

Di Konferansa Aliyan (COP) de ku di çarçoveya Peymana Çarçoveyê ya Guhertina Avhewayê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) de îsal cara 24'an hat lidarxistin, ji bo pêşîgirtina li germahiya global hin pîvan hatin destnîşankirin. Civîna bilind a COP24'an li bajarê Katowîce yê Polonyayê hate lidarxistin. Ji ber ku hin welatan dema danûstandinê dirêj kirin, konferans rojek dereng qediya.

Di dawiya konferansê de, ji bo bicihanîna Peymana Avhewayê ya ku sala 2015'an li konferansa COP21 a li Parîsê hat qebûlkirin, hin pîvan hatin diyarkirin.

***Xalên sereke yên van pîvanan wiha ne:***

Ji sala 2020'an û pê ve, her welat wê du salan carekê raporan pêşkêş bike û diyar bikin bê ka rêjeya kêmkirina belavkirina gaza serayê daxistiye çi astê.

Welatên ku mohra xwe danîne binê peymanê neçar in ku pîvanên belavkirina gaza serayê bi rêbazên ji aliyê zanistî ve tên qebûlkirin, bikin.

Ji sala 2023'an û pê ve her 5 salan carekê wê rewş bê nirxandin û welatên mohra xwe danîne binê peymanê dê bipîvin bê tedbîrên ku girtine têr dikin an na.


Welatên pîşesaziyê, dema ku li ser daxwaza welatên pêşketî alîkarî bi wan welatan re kirin, neçar in nîşan bidin bê alîkariya dikin çiqasî ji bo pêşîgirtina li germahiya global e. Alîkarî divê bi giranî ji bo pêşîgirtina li karestên xwezayî û zêdekirina para enerjiyê dikare were nûkirin be.

Komîteyeke Neteweyên Yekbûyî wê kontrol bike bê ka welatên soz dane ku emîsyona gaza serayê kêm bikin, di çi astê de hewl didin.

Welatên ku armancên di mijara avhewayê de hatine danîn bi cih neanîne, dê nikaribin ji pêkanîna 'Sertîfîkaya CO2' sûdê werbigirin ku ev sertîfîka di bazirganiya navneteweyî de derbas dibe. Peymana Avhewayê ya sala 2015'an ji bo wê yekê ye ku germahiya global heta sala 2100'î herî zêde di asta 1,5 an jî 2 pileyî de be. Ev rêje li gorî germahiya sedsala 19'an e. Li gorî lêkolînan, ger germahiya global li gorî sedsala 19'an bi 2 pileyî zêde bibe, dê gelek karesatên avhewayî rû bidin. Konferansa Aliyan a 25'an (COP25) wê sala bê li Şîliyê pêk were. *KATOWÎCE*




## Zarîf: Amade ne bi DYA'yê re hevdîtinên rasterast bikin!



Wezîrê Karên Derve yê Îranê Mihemed Cewad Zarîf ragehand ku ger rêz ji encamên wê re bên nîşandan, ew amade ne bi Washîngtonê re rasterast hevdîtinan bikin.

Li gorî ajansa fermî ya nûçeyan a Qeterê QNA, li Qeterê di forûma 18'mîn a Dohayê de Wezîrê Derve yê Îranê Mihemed Cewad Zarîf di axaftina xwe de ragehand ku berê jî li gel Amerîkayê diyalogên wan hebûne û gihîştine peymanekê lê di serokatiya Donald Trump de rêveberiya nû ya Amerîkayê êrîşî rêveberiya Tehranê kiriye û ew peyman rawestiyaye. Zarîf diyar kir ku bi mercên ku rêz ji encamên wê re bên nîşandan, ew amade ne li gel Washîngtonê hevdîtin û guftûgoyan pêk bînin.

Mihemed Cewad Zarîf destnîşan kir ku rêveberiya Amerîkayê xwe ji peymanê vekişandiye û bi wî awayî biryara Konseya Neteweyên Yekbûyî binpê kir û aliyên binpê jî nakin gefan li wan dixwe.

Zarîf her wiha got ku dema ku Amerîkayê xwe ji peymanê vekişandiye, mafê wan jî hebû ew xwe ji peymanê vekişînin û wiha got: "Lê kengî em bifikirin ku berjewendiyên me di wê peymanê de hene em ê bi peymanê ve girêdayî tevbigerin." *DOHA*



## Şerê li Yemenê dijwar dibe: 29 kes mirin

Tevî ku agirbesta di civîna Stockholma bajarê Swêdê de hat ragihandin jî li parêzgeha Hudeyda ya rojavayê Yemenê şerekî dijwar rû da.

Çavkaniyên ji herêmê ji ajansa nûçeyan ya AFP'ê re aqûbeta şer ragihandin. Çavkaniyan destnîşan kir ku şerekî gelekî dijwar heye û ragihandin ku 29 kes di şerê aliyên dijber (Hûsî û hêzên Yemenê) de hatin kuştin û 22 kes jê endamên Hûsiyan in.

Her wiha El Mesîra Net a alîgira Hûsiyan jî diyar kir ku bi zêdetirî 50 roketan êrîş hatine kirin û 7 caran balafirên şer El Dirêhmî bombebaran kiriye.

Balkêşiyeke din a van pevçûnên dawîn ew e ku piştî hevpeymana agirbestê di navbera Hûsiyan û hêzên Yemenê de li Swêdê hat îlankirin, rû da. *SANA*




## Hûmara 58. a Kovara Vateyî weşanîyaye

**AMED -** Weşanxaneyê Vateyî ke bitaybetî Kirmanckî ser o xebetîyeno û heta nika bi seyan kitabî û 57 hûmarê kovara Vateyî çap kerdî, humara 58. a Kovara Vateyî weşanaye. Kovara Vateyî ke serra 1997î ra nata safî Kirmanckî weşanê xo kena, ziwan, kultur, huner û xeylî babetanê bînan bi Kirmanckî wendoxanê xo rê pare kena. Kovara ke 21 serrî yo bi hawayêkê perîyodîkî weşanê xo domnena, averşîyayîş û standardbîyayîşê kirmanckî de wayîrê rolêkê muhîmî ya.



# Sinclaire: Tecrîd nêno qebûlkerdene

Dîrektora HRWyî ya Tirkîye Emma Sinclaire daye zanayene ke standardê bewlîkerde yê CPTyî estê û va: "2 serrî ra vêşêr yewna kesî dir pênêdîyayîşê Ocalanî nêno qebûlkerdene. Ewropa rind zana ke Tirkîye de se bena. Naye ra binpaykerdişê heqanê merdiman ê Tirkîye yenê peygoşkerdene."

Rayberê Şarê Kurd Abdullah Ocalano ke 15ê Sibata 1999î ra nata binê tecrîdêko girankerde de yo, 11ê Êlula 2016î ra nata ti xebere tira nîna girewtiş. Vera tecrîdo girankerde de kurdî bireaksîyon î û çalakîyê tewir bi tewirî yenî viraştiş. Dîrektora HRWyî ya Tirkîye Emma Sinclaire tecrîdê serê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî û binpaykedişê heqan yê Tirkîye ser o qisey kerde.

Sinclaire destpêkê qiseykerdişê xo va 'Verî hîna zaf kurd û dormeyê çepî raştê binpaykerdişê heqan ameyêne, la ewro her hetî ra mexdûrî estê' û wina dewam kerde: "Heme vengê muxalifî yenê muhakemekerdene. Muxalifê her hetan yenê qedexekerdene."

Sinclaire ard ziwan ke derbeyî ra dima mabênê 2 û 3 hezarî de leşkerî ameyî tepiştene, êyê ke mendî zî derbekerdişî ra nê, endamîya organîzasyonî ra ameyî muhakemekerdene û wina domnaye: "Zafê nê kesan bi hawayêkê keyfîyî ameyî muhakemekerdene û tepiştene. Zafê dosyayanê merdiman de fealîyetê 'terorî' çinyo, la nê kesî zî çarçiwaya mucadeleyê hemverê terorî de yenê muhakemekerdene."

**Seke her çî normal o têgêrenê**

Sinclaire dewamê qiseykerdişê xo de nê vatî: "Ma sey Human Rights Watchî hemverê her tewirê tecrîdî de yê. Xusûsen CPTyî xeylî reyan meseleyê tecrîdî de Tirkîye krîtîk kerdêne. Ocalan zî tede seba tepişteyî bieşkê heqanê xo yê sosyalan ra îstîfade bikerê Tirkîye ser o zextî estbî. La ewro nuqteya ke ma resayê ci de seke ma her çîyî kerdo xo vîr ra, nê meseleyî nênê munaqeşekerdene seke nê çîyê normalî bê."



**Binpaykerdişî yenê peygoşkerdene**

Sinclaire qiseykerdişê xo de va 'tecrîd hendî tenya seba Ocalanî nê seba tepişteyanê bînan zî bîyo problemêko xeylî pîl' û va: "Çende bêveng bimanê zî tayê qayde û standardê CPTyî estê. Di serrî ra vêşêr yewna kesî dir pênêdîyayîşê Ocalanî nêno qebûlkerdene. Ewropa rind zana ke Tirkîye de se bena. Naye ra binpaykerdişê heqanê merdiman ê Tirkîye yenê peygoşkerdene. Çîyê ke Cizîre de ameyî ciwîyayene versîya krîzê multecîyan ê Sûrîyeyijan de mendî. Ma sey sazîya heqanê merdiman ûca se bibi derheqê ci de rapor amade kerd. Dimayo ke derbe ame viraştene reyêk de her çî birîya. Ame waştene ke serê qewimîyayîşanê Cizîre bêro girewtene."

**Kişîyayîşê sivîlan û hêrişî**

Sinclaire peynîya qiseykerdişê xo de nê vatî: "Tirkîye îdîa kena ke huqûqê şerî ê herêman de nêvêreno. Wazena ke sûcê şerî nêrê munaqeşekerdene. Her çende hukmat biccardişanê xo sey 'mucadeleyê hemverê terorî' name bikero zî ganî ma çarçiwaya huqûqê merdiman de nizd bibê. Kişîyayîşê sivîlan û hêrişê hemverê cayanê ke herêmê şerî nêyê estbî û nê çîyî zî hetê sazîyanê heqanê merdiman ra ameyî îspatkerdene." ***BERN***

## Hepsîyê Mêrdînî nêeşkenê bêrî têhet



**Ame zanayene ke Zindanê Tîpa Eyî yê Mêrdînî de îdareyê zindanî pêvînayîşo akerde qedexe kerdo û ciniyê ke kewtibî grev zî cigêrayîş ameyî sehnayîş û yew aşmîyo ke hepsî nêeşkenê pêvînayîşo akerde bikerê.**

**Hepsîyî bi hemkarîya keye û avûkatanê xo mesaj eşrawitî û dîyar kerdî ke pêvînayîşo akerde bîla sebeb ameyo qedexekerdiş û veng dayî ke ganî na rewşe bêra sererastkerdiş. Zindano ke her ke şono ci de teda zêde beno, verê zî pêvînayîşê avûkatan kerdibî binê qeydan û cok ra hepsî bi aşman nêvejîyayî pêvînayîşê avûkatan. Pêwa îtîrazê avûkatan selahîyetdarê zindanî gamêk apey nêeştî.** ***MÊRDÎN***

## 'Ma bi Ocalanî mucadele şinasna'



Vizêr şaristanê Kolnî yê Almanya de bi tewrbîyayîşê vervatoxê Meclîsê Neteweyî yê Afrîkaya Başûre Leshesa Tsenoli, parlamentera Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) ya Mêrdînî û avûkata Ocalanî Ebru Gunaye û parlamentera verêne ya HDPyî Dîlek Ocalane panelêk ame viraştene. Moderatorîya panelî hetê rojnamegere Elîf Sonzamanciye ra amî kerdene.

Panel de ewilî partîya ANCyî ra vervatoxê Meclîsê Neteweyî yê Afrîkaya Başûre Leshesa Tsenoli qisey kerde û va: "Ma mucadeleyê xo de Amonka vanê. Seba paştîdayîşê şima û serbestîya Ocalanî ma tîya yê. Ma bi vengê ê mucadeleyê Rojhelato Mîyanênî nas kenê. Ma paştî danê çalakîya Leyla Guvene û ganî tecrîd tavilî bêro wedartene."

Parlamentera HDPyî ya Mêrdînî û avûkata Ocalanî Ebru Gunaye zî qisey kerdî û vatî: "Mi avûkatîye zî kerde û rîyê qesasgirewtox ê dewlete dir amîya têrî. Sebebê apeygirewtişê qezencanê Îmraliyî xoverdayîşê Kurdan o. Hewna zî heyetêkê weşîye nêşîyo Îmrali û waştişê ma nêameyî qebûlkerdene."

**CPT gureyê xo nêkeno**

Parlamentera HDPyî ya Mêrdînî ya verêne Dîlek Ocalane zî qiseykerdişê xo de va: "Embaze Leyla vat ke 'şima nêeşkenê rayberê şarêk ser o polîtîkayêka winayêne bica biyarê.' Ma mucadeleyê embaze Leyla rê hurmet ramojnenê. CPT zî vano ke îşkence çinyo, no tecrîd nêyo. Na sazî gureyê xo nêkena. 6 mîlyonî merdiman vat ke 'Serek Apo îradeyê ma yo.' Azadîya serek Apoyî azadîya ma ya." ***KOLN***

## Balat de dikano ke bi vîrardişan dekerdeyo

Aylîn Serînpinara ke Stenbol de ameya dinya û pîl bîya 1982an de sey karmend PTTyî de dest bi kar kerda û badê teqawîtbîyayîşî dikanêk akerda. Serînpinare qiseykerdişê xo de qala akerdişê dikanê xo û çîyo ke ê hes kena dikanê xo de roşena kerde.

Serînpinare wina va: "Mi waşt ke ez bazarwanî bikera. La o karê bi ekîb beno. Mi her wext hacetê kehenan hes kerdêne û mi objeyê qij kome kerde. Mi taxa xo de dikanêke girewte. Mi bi xêrê înternetî hacetan rot. Hîn hacetî estbî ganî biameyne tamîrkerdiş, pakkerdiş. Kesê ke demê verî hez kenê nê hîsgêrî baş zanê. Ez zaf hewl dana ke xişirê serrê 60î, 70 û 80an kome bikera. Hacetêke bi 50 TL yeno girewtiş, siba beno bi 100 TL bêro rotiş. Temaşekerdişê hacetê kehenan mi kêfweş keno. Ez înan pak kena, viraznena û tamîrê înan kena. Ganî heme ciniyî xo kifş bikerê û karê ke ci ra hes keni bikerî." ***STENBOL***





## Zimistanê tîya zaf zehmetin o

Ameyîşê zimistanî reyde dinya bî serd. Herêmê ke tewr zêde benî serd ra yew zî Dêrsim o. Hewteyêk o ke qeza û dewanê Dêrsimî de vewre dest pêkerda. Na rewşe tewr zêde tesîrê xo dana dewanê ke bi heywankarî debara xo kenî ro. Dewijê Mezraya Hecî Cemalî ke 7 keye aye de estî zî bi heywankarî debara xo kenî. Dewijî bale antî zor, zehmetî û rindîya zimistanî ser o.

Derheqê babete de dewijan ra Muslum Karakuşo 56 serrî û Makbule Karakuşe qisey kerdî û vatî: "Yeno ma vîr nîmo ma vîr, ma heywankarî kenî. Heywankarî tewr zêde zimistanî de zehmet o. Çimkî heywan zerre de yî. Nizdîyê 200 pezê ma estî. Ma wazenê şêrî zozanan, la qedexekerdeyî. Serra 1994î de dewa ma ame vengkerdiş. Ambargo ronayî dewan ser o. Ma koçê xeylê bajaranê cîya cîyayan kerdî, la ti cayêk sey dew û herra merdimî rind nîya. Ma cuya dewe ra zaf kêfweş î. No proses de zaf zehmeto ke merdim debara xobikero. Ganî heme kesî agêrî dewanê xo." ***DÊRSIM***

**ROJA NEWE**
Serhildan ANDAN
laser.zizzz@gmail.com



## Heqê dewlete û heqê merdiman

Heq, edalet û hiqûq… Her wext nê hîrê çiyê muhîmî bîyê babetê munaqaşeyan û her kes goreyê xo nê her hîrê çiyanê muhîman şuxulnayo. Heq her çiyî ra ver seba heme merdimayîye esto û çiyo ke bêro dayene ney çiyo ke xura eîdê merdimî yo. Labelê tarîxê merdimayîye naye bi tewrêko bîn ma rê nîşan dano. Tarîx de zî ma vînenê ke her tim îqtîdarî bîyê û nê îqtîdarî heqo ke eîdê her kesan o, girewtê binê kontrolê xo û eke biwazî dayî merdiman. Vera naye de ê ke wayîrê heqî bî her tim sere wedarnayî û kerdê ke heqo ke eîdê înan o, bigîrî destê xo. Hîrê çiyanê muhîman ra yo heq, ma vat, labelê awanbîyayîşê dewletan ra dima 'hiqûq' o ke nê hîrê çiyanê muhîman ra yo vejîya orte û seba ke merdimî biresî heqanê xo hiqûq xo rê sey rayîrêko pîroz dîyê. Helbet hiqûq ê çiyanê muhîman ra yo labelê her çiyî ra ver estbîyayîşê hiqûqî kesê ke heqanê xo ra mehrûm bîyê ra ney, îqtîdarî ra hêna zêde feyde dayo û kerdo ke merdimi bi qeraranê îqtîdarî yan zî bi nameyêko bîn dewlete bikewî heqanê xo dima… Bi no qeyde ma eşkenî vajî ke mîyanê nê hîrê çiyan de çiyo ke hetê îqtîdaran ra ma rê ameyo ferzkerdiş zî esto.

Heq û hiqûq na çarçewe de vejîyenî ma ver û esasê xo de edalet heminan gêno mîyanê xo. Edalet estbîyayîşê merdimayîye ra heta nika esto û bingeho en pîl o cuye yo. Çunkî eke cayêk de edalet çin bo uca de tu kes nêeşkeno behsê heq û hiqûq bikero. Aye ra her çiyî ra ver cuye de esas edalet o û kamca de beno wa bibo bê edalet çiyêko bîn nêeşkeno cuye saz bikero. Aye ra gêrayîşê heme merdiman esasê xo de edalet o; heq û hiqûqo ke yenî waştene heme seba resayîşê edaletî yê. Seserra 21ine de no gêrayîş heme wextan ra hêna zor o labelê ê ke heqê xo dima yê heme çiyan girewtî çimanê xo ver û seba ke heqê xo bigîrî û edaleto esasin awan bikî mucadeleyêko pîl danî.

Hewteyo verên hewteyo heqê merdiman bi. Hewteyêko winasî de heme dewletan de eynî fotografî ameyî antene. Her cayê dinya de hewteyo heqê merdiman de îhlalê heqan ameyî ciwîyayene. Şer, pêrodayîş, koç, zilm û her tewir îhlalî no dem de ameyê ciwîyayêne û heqê merdiman binê linganê îqtîdarî de hêna sey her wext pelexîya. Bitaybetî çiyê ke no hewte Kurdistan de ciwîyayê; kerdenanê dewleta tirke vetê çimanê heme kesan ver. Û şexsê dewleta tirke de kerdenanê heme dewletan xo mojna heme kesan. Heq, hiqûq û edalet nê her hîrê çiyê muhîmî no hewte de hêna binê lingan de bîyê û tena çiyêk mojnayî ma; heqê dewletan û heqê merdiman cîya yê. Kamcîn hêz, kamcîn dewlete û kamcîn pergale beno wa bibo, heta ke merdimê bindest û mezlûmî nêresî heqanê xo û edaleto raşteqîn o merdimayîye awan nêkerî; heq beno di lete û yew beno ê dewlete yew zî beno ê mezlûman. Do mezlûmî heqê xo yê bigîrî û hişmendîya dewlete ya îhlalker û zilmkar perçe bikerî. Mucadeleyo ke Kurdistan de yeno dayene mojneno heme dinya ke tu hêrişî nêeşkenî vernîya gêrayîşê heq û edaletî bigîrî û şaran biqedînî…

www.arsivakurdi.org

# Dengbêjî hezkirin e nikare bê hînkirin

Di dengbêjiya kurdî de radyoyên mîna Radyoya Erîwanê, Radyoya Bexdayê û Radyoya Qesrî Şîrînê roleke mezin lîstine. Dengbejî hezkirin û qabileyet e nikare bê hînkirin

Kadrî ESEN / AMED

Dengbêjî ji rêbazên ragihandinê ya herî kevn e û devkî ye. Heta nivîs hatiye kifşkirin û pê berhem hatine afirandin jî girîngiya xwe ya di nav civakan de domandiye. Lê piştî demekê şûn de ji ber pêşketina nivîsê bandora xwe ya di nav gelek civakan de winda kiriye. Ji ber zext û pêkutiyên dagirkerên Kurdistanê yên li ser zimanê kurdî, gelek serpêhatiyên kurdan berevajiyê civakên din bi rêya dengbêjiyê heta roja me ya îro hatine. Ji ber vê yekê ye hê jî çavkaniyên bingehîn ên folklara kurdî kilamên ku dengbêjan gotine ne.

Di nav civakê din de her çiqas dengbêjî girîngiya xwe winda kiribe û dengbêj hindik mabin jî di civaka kurd de hê jî dengbêjî girîng tê dîtin û ji aliyê lêkolînerên kurd ve li serê lêkolîn tên kirin. Yek ji van lêkolîneran jî Mahmûd Begîkê kurê alimê welatparêz û bi nav û deng Mele Evdilayê Timoqî ye. Begîk ji ber ku di nav malbateke kurdewar de mezin bûye bala wî her li çanda gelê wî ya qedîm bûye û li ser çanda dengbêjiyê ya gelê kurd gelek lêkolîn kirine.

**Rolek mezin lîstine**

Begîk lêkolîna xwe ya herî dawî jî li ser Şahê Dengbêjan Reso kiriye û gelek aliyên dengbêjiya Reso derxistine holê. Begîk di vê lêkolîna xwe de li ser dengbêjiyê rawestiyaye û behsa wate û girîngiya dengbêjiyê ya di nav civakan de kiriye. Her wiha jiyana Reso lêkolîn kiriye û gelek taybetmendiyên Reso bi me daye zanîn. Dîsa bi awayekî berfireh naverok û mijara kilamên ku Reso straye bi hûrgiliyên wan re raxistiye ber çavan.

Me jî xwe gihand lêkolîner Begîk û li ser dengbêjiyê pê re sohbetek kir. Begîk di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku mala wan di navbera navçeyên Sason û Hezo yên Êlihê de wek medrese bûye û ji bavê xwe Mele Evdilayê Tîmoqî perwerdeyeke baş wergirtiye. Piştî ev agahiyên xwe yên malbatî Begîk bi pirsên me re ket nav mijara dengbêjiyê û da zanîn ku di ragihandina dengbêjiyê de radyoyên mîna Radyoya Erîwanê, Radyoya Bexdayê û Radyoya Qesrî Şîrîn roleke mezin lîstine.

**Pîvan û ast hene**

Begîk di dêrijiya sohbeta xwe de anî ziman ku di dengbêjiyê de pîvan û ast hene û wiha behsa wan kir: "Di dengbêjiyê de pîvan hene. Hinek pîvanên dengbêjiyê her kes li serê hemfikir e lê hinek pîvan jî hene ku lêkolîner li ser hemfikir nîn in. Her kes dibêje deng û bêj ango bikaranîna deng e. Ev ji bo dengbêjiyê ne bes e. Kilamên ku dibêjin divê lihevhatîbin. Gotinên nav stranên divê li hev bên. Nabe ku tu gavek li deşta Mûşê bixî û gavek jî li beriya Mêrdînê bixî. Her wiha di dengbêjiyê de ast jî hene û asta herî bilind jî destanbêjî ye."

Begîk destnîşan kir ku di dengbêjiya kurdî de du cure leheng hene û van lehengan bi van mînakan aşkera kir: "Di dengbêjiyê de lehengên veşarî hene ku qet navê wan nayê gotin. Wek mînak; Delalê. Di heman demê de lehengên aşkera jî hene ku navê wan gelek caran derbas dibe. Wek mînak; Derwêşê Evdî." Di berdewamê de jî Begîk Evdalê Zeynikê bi bîr xist û got ku pêwîst e dengbêj bi xwedî bin û wiha pê de çû: "Mesela em çima wek şahê dengbêjan Evdalê Zeynikê qebûl dikin? Ji ber ku dengbêjekî bi xwedî ye. Em ji Evdal wêdetir dengbêjên xwe nizanin. Halbûkî jê wêdetir jî dengbêjên kurdan pir hene. Lê ji ber ku bê xwedî ne kes wan nas nake."

**Dengbêjî û amûrên ragihandinê**

Begîk di berdewamê de li ser nêzîkatiya rêxistin, tevger û çapemeniya kurdan a ji bo dengbêjiyê jî rawestiya û der barê de vê jî ev nêrîn bi me re parve kirin: "Nêzikbûna rêxistin û tevgerên kurdan jî bandorê li ser dengbêjiyê kiriye. Ji ber cih û demê çapemeniya kurd jî di asta ku tê xwestin de girîngiyê nade dengbêjiyê. Ji bo pêşxistina dengbêjiyê divê li şûna studyoyê bi taybetî bi dengbêjan re bername bên çêkirin û di demên vala yên televîzyonan de kilamên wan bên weşandin."

Stranên dengbêjên berê û yên niha wek hev bandorê li mirovan nakin. Li ser pirsa me ya sedema vê yekê jî Begîk ev nirxandin kir: "Ji ber şert û mercên demê stranên berê bandora wan zêde ye. Lehengên demê gelek deng dane. Li aliyê din şêwe û pêşketina amûrên ragihandinê jî bandorê li kilaman û civakê dike. Demên berê bûyer tenê bi dengê dengbêjan dihat bihîstin. Lê niha ne wisa ye. Niha dema bûyerek diqewime di heman demê de bi deng, nivîskî û dîmen tê ragihandin. Tu bikî nekî jî ber van sedaman kilamên niha li ser bûyeran bên çêkirin dê wek kilamên berê bandor li civakê nekin. Ji ber ku beriya kilamê jixwe ew hatiye ragihandin."



**'Malên dengbêjan girîng in'**

Pirsa me ya têkildarî pêwistiya ji bo pêşxistina dengbêjiyê jî Begîk bi van gotinan bersivand: "Ji ber ku dengbêjî nayê hînkirin ji bo dengbêjiyê pêwîstî bi qurs û dibistanên dengbêjiyê tune ye. Lê vekirina malê dengbêjiyê gelek girîng e ku beriya niha gelek malên bi vî rengî hatine vekirin. Dengbêj li van malan tên gel hev û li ser çawaniya dengbêjiyê nîqaşan dikin. Dengbêjî bi xwe hezkirin û qabileyet e nikare bê hînkirin." Begîk herî dawî ji bo muzîkê jî got ne şert e bê bikaranîn lê bi şertê ku kilamê nefetisîne dikare bê bikaranîn.

**Bûyer neqil kirine**



Mahmûd Begîk got ku ji bajarê Qersê bigere heta çiyayê Kurmênc, kurdan ji van radyoyan stranên dengbêjiyê yên bi zaravayê kurmancî û soranî guhdar kirine û bi van gotinan qala rewşa dengbêjan a beriya radyoyan kir: "Beriya radyoyan jî dengbêjan dema ku bûyerek li herêma wan biqewimiya dikirin stran û bi derfetên xwe li herêmê digeriyan weke rojnamegerekî bûyerên li herêma xwe ji herêmên ku lê digeriyan re neqil dikirin."

Dengbêj berê di civakê de gelek bi qîmet bûne û her tim li civata cihê herî baş ji wan re hatiye veqetandin. Begîk qala vê qîmetdayîna dengbêjan jî kir û ev tişt anî ziman: "Dengbêj ji bo dewetan dihatin vexwendin. Li serê civatê rûdiniştin û ji maqûlên ku beşdarî dawetê dibûn re stran digotin."

Begîk angaşt kir ku çanda dengbêjiyê çanda mîrgehên kurdan e û ev tişt gotin: "Berê mîrgehên Kurdistanê hebûn. Dengbêj piranî ji aliyê mîrgehên Kurdistanê ve dihatin xwedîkirin. Mirov bi hêsanî dikare bêje çanda dengbêjiyê çanda mîrgehên kurdan e."

## Reqsvanekî hestiyarê civakê

Karwan Omar pedagogekî kurd ê reqsvan e; ew di heman demê de kareograf û midûrê şirketeke dansê ye jî. Karwan Omar li Silêmaniyê hatiye dinê û beriya bi 19 salan berê xwe daye Swîsreyê. Ev bêhtirî 30 salan in ku ew weke şanogerekî û reqsvanekî çalak e.

Karwan beşa Hunerên Bedew qedandiye ji zanîngeha Silêmaniyê. Li zanîngeha Swîsreyê mastira Reqsa Pedagojîk kiriye. Herçî şirketa wî ya dansê ye jî rêxistineke ne karê û fêdeya şexsî ye; di warê siyasî û olî de jî serbixwe ye. Ew sala 2013´an beşdarî yekemîn Mîhricana Şanoyê ya Navneteweyî ya Bexdayê bû û xelata juriyê wergirt.

Yek ji projeyên wê yên dawî "Moonlight Dance" e ku cara pêşî di 2015'an de li gelek bajarên Swîsreyê hat nîşandan. Herçî karê wî yê li Kurdistanê ye, li navenda wê hêzdarkirina kesên bi dezavantaj û civakî lawaz heye.

Wî ji bo xwendekarên li Kurdistanê, pirtûkeke li ser reqsê wergerand kurdî. Karwan wekî din weke reqsvanekî solo jî kar dike û performansa wî ya bi navê "The Stories of a Woman: A Dance (Serpêhatiyên Jinekê: Reqsek)", wî li derve li Parka Dayik a Silêmaniyê nîşan da. Bi vê dansa xwe wî zor û zehmetiya jinê di civaka kurd de li ser dikê nîşan dan. Ji bilî vê wî gelek performans kirin yan jî bi rê ve birin ku ji bo zarokên bi kanserê ketî, penaberên li Iraq û Kurdistanê û ji bo wan jinên ji destê DAIŞ´ê filitîn. *BERN*



## Girîngiyê nadin hunerê



Hunermend û derhênerên başûrê Kurdistanê li ser rewşa hunerê ya li başûrê Kurdistanê nêrînên xwe anîn ziman. Li gorî hunermendan rewşa hunerê li başûrê Kurdistanê lewaz e, ev jî bûye sedemê wê ku berhemên biyanî cihê berhemên navxweyî bigre û civakê bi aliyê xwe bikêşe.

Derhênerê bi navê Nasir Hesen li ser vê yekê wiha got: "Sermayedar ne dostên hunerê ne û budceyek baş nîne weke ku pêwîst e hunera navxweyî ya başûrê Kurdistanê pêş nakeve. Çalakiyên hunerî yên ku tên kirin, nabin bersiva hunerê. Ger budceyek baş hebe, dê rêzefîlmên kurdî werin çêkirin û pêngavek baş bê avêtin."

Derhêner Wahîd Kifrî jî li ser sedema lewaziya hunerê li başûrê Kurdistanê wiha got: "Mixabin heya niha weke pêwîst Wezareta Rewşenbîrî ya başûrê Kurdistanê girîngî nedaye hunerê. Heya niha tu projeyek baş nehatiye danîn."

Rewşa şanoyê jî, ji ya rêzefîlman ne cuda ye. Şanoger Roşna Ehmed got ku heya niha di nav civakê de rola şanoyê nehatiye dîtin û wiha got: "Tu budceyek baş ji bo şanoyê nayê xerckirin, ji bo şanoyek baş pêwîstî bi budceyek baş heye. Ji ber ku budçe dikare hemû beşên şanoyê temam bike. Pêwîst e kar ji bo şanoyek baş bê kirin û bi civakê were nasandin." *SILÊMANÎ*

## LI KOBANÊ ŞEVBÊRK

Tevgera Çand û Hunerê ya kantona Kobanê bi amadebûna bi dehan kesan li navenda Çand û Hunerê ya Baqî Xido şevbêrkeke hunerî li dar xist. Şevbêrk bi armanca ku gel teşwîqî bike da ku bi çand û kevneşopiya xwe bijî hate lidarxistin.

Şevbêrk bi rêzgirtinê dest pê kir, paşê endamê rêveber ê Tevgera Çand û Hunerê Osman Bekî axivî û da zanîn ku, dema civak li çanda xwe xwedî derkeve tu kes nikare êrîşî wan bike. Piştra Koma Fîlman a Rojava belgefîlmeke ku li ser çanda kevnar amede kiribû pêşkêş kir. Paşê koma kevneşopiyan stranên folklorîk gotin, her wiha hejmarek dengbêjên Kobanê stran gotin, beşdaran jî bi kêfxweşî û bi çepikan şevbêrk germ kirin. *KOBANÊ*



www.arsivakurdi.org